

Jîn

Jimara êkê

Heyva Eyarê 2006

Vercinye, Emrîke

perê - 1

Gelî xoşk u bira. Ez silava li we dikim êk u êk. Ez hîvîdar im jîaneka keyf u xuş biburînin.

Ez kiçek Emrîkî me. Ez mamosta zimanê Inglîzî me. (Min masters bi “Teaching English as a Foreign Language” heye.) U ez dê bu we bêjim çawa Kurdî fer bîm.

Ji berî sêzde sala ez çûm devera Zaxo li gel rêkxistîekê (minezemekê); 15 heyva mam li wêrê. Ez li gel malekê ji xelkê Zaxo jîam. Min gelek divîa ez ziman u ‘edetê Kurdî fêr bîm.

Min hindek kitêbê zimanê Kurdî nivîsîn da Emrîkî fêrî zimanê Kurdî bin. (Ferhengê sehî ke www.dcklci.com/dictionary.) U min jî sîdî bi zimanê Kurdî tumar kirin bu xwandinê.

Min têklîa gelek Kurda kirî ye, u ez gelek heş li wan dikim. Dergehê wana bu min vekirîne. Ez gel jinkê wan diaxivim. (Axiftina min ne wek êke Kurde, bes ez heş dikim ez êk ji wan bîm.) Ez digel biçîkê hevalê xû bisteh im. Bawerîa hevalê min yê Kurd gelek bi min têt. Ez digel wana çim dîxtura u dezgeha bu tercimanî.

Heker dawet an tazî hebin, ez li gel wan im. Wextê Xwidê biçîka dit hevalê min, ez bi şulê destê xû bu wan dîarîa çêdikim. Ez gelek harî karîa wan dikim.

Ez sê sala çûm Dihukê u Zaxo u Hewlêrê digel hevalê xû yê Emrîkî. Em dersê zimanê Inglîzî bidîne xwîndikara. Her sal ez dersê zimanê Kurdî dime Emrîkîa bu yê divên zimanê Kurdî fêr bin.

Ev nivîsandina he li hindava dergehê li zanku University of South Carolina li Rojhelata Emrîke:

Were fêr be, herre xizmetê bike.

Ez du’a dikim ev nivîsandina he “Jîn” bi dilê her kesekê bit u xizmeta xelkê we bikim. Heker te divê guvara “Jîn” belave bikî, kerem ke. (An bêje hevalê xû îmêla xû bu min virêke: jeenuazadi@cs.com.) Hîvîdar im heyva bêt nivîsandinekî dî bu we binvîsim. U gelek supas.

Silavê min bu we heya heyva bêt.
Xoşka we, Şîrîn